

,Yek bi Yek‘ – Piştgirî ji bo Entegresiyonê û jiyana rojane

Agahdarî ji bo beşdaran

Pêşiyarî	<p>Di projeya 'Yek bi Yek' de em ji bo we li peywenderekî (kesê têkiliyê) digerin. Ev kes dê di pirsên rojane de alîkariya we bike, Basel nîşanî we bide û bi we re bi Almanî biaxive. Di heman demê de ew dikare lêgerîna ji bo xaniyekî an karekî an jî ji bo têgihîştina nameyan bibe alîkar.</p> <p>Kesê peywender dilxwaz e, li vir baş tevle civakê (entegre) bûye û amade ye ji bo naskirina mirovan û piştgirîkirina wan.</p>
Rêz û qayde	<ul style="list-style-type: none"> • Hûn bi dilxwazî beşdarî vê projeyê dibin. • Hûn biryarê didin ku hûn bi kîjan kesa/ê têkiliyê re hevdîtîne bikin. • Hûn her hefteyekê an jî 14 rojan carekê ji bo 1-2 saetan bi kesê peywender re dicivin. • Eger jivanek an jî çavpêketinek ne guncav be, bi kêmanî rojekê pêşde kesa/ê têkiliya xwe agahdar bikin . • Berî ku hûn wêneyekê an vîdyoya kesa/ê têkiliyê bikşînin, ji kerema destûrê ji wê/wî bixwazin. Ji kerema xwe berî ku wê bêtir parve bikin jî (Whatsapp, Facebook, ...) dîsa destûrê bixwazin. • Ji kesa/ê pêwender pereyan nexwazin ji ber ku Xaça Sor pereyan nade wê/wî. • Heke hûn dixwazin hevdîtinan rawestînin, bi karmenda/ê berpirsiyar re li cem Xaça Sor têkiliyê daynin.
Rêveçûn	<ul style="list-style-type: none"> • Li nik Xaça Sor bi amadebûna xebatkarekî Xaça Sor hevdîtineke destpêkî bi kesê pêwender re pêk tê. • Sê-çar civînên destpêkê wek dema ceribandîne tîn hesabandin. Xebatkarê Xaça Sor a berpirsiyar wê hingê bi we re têkiliyê bike û bipirse eger hevdîtîna baş derbas dibin. • Cih û dema hevdîtînan ne pêşdiyarin û bi hev re tîn nîşankirin. • Têkilî herî kêr 6 mehan berdewam dike.
Mesref	<p>Pêşniyar belaş e û hûn tu mesrefê nadin. Eger hûn û peywender di civînan de (mînak qehweyê vexwin), her kes ji we pereyên xwe dide.</p>
têkilî	<p>Hûn dikarin bi rêya WhatsAppê bi Xaça Sor re têkilî daynin. Eger pirsek an pirsgerêkek we hebe, hûn dikarin bi hejmara jêrîn re têkiliyê daynin: 078 410 35 85. Em hin caran peyamên WhatsApp-ê ji bo agahdariyan, bilêtên belaş an bûyeran dişînin. Heke hûn nexwazin van peyaman werbigirin, hûn dikarin hertim binivîsin.</p>